www.arsivakurdi.org

hejmar 64 - Bihara 2019

# KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

## Civîna 64an li Almatayê

Civîna Kurmancî ya 64an bi mêvandarîya civata Berbangê ya kurdên Qazaxistanê di navbera rojên 16.06 – 24.06.2019an de li bajarê Almatayê li dar ket.

Kurdên Almatayê û Qazaxistanê kurdên cihêlî ne, sirgûnkirî ne û zêdetir ji 80 salan e li wan deran dijîn.

Piranîya kurdên Qazaxistanê, di serdema Stalîn de, ji salên 1937 - 44an de ji devera Naxçiwana Azerbaycanê, Misxet û Batûma Gurcistanê hatine rakirin û şandine Asyaya Navîn. Rejîmê ev karê han bi awayekî gelekî hovane anîye cih. Kurd ji erdê wan, ji gund û êrdimên wan hatine hilkirin, xistine vagonên bar û veguhastina heywanan. Bi dirêjahîyades çend hefteyan, zar û zêç, kal û pîr, di wan vagonan de, berê wan tî û birçî dane diyarekî çûn û nehatê. Di rê de, bi sedan kes ji nexweşîyê telef bûne û ew ji trênê avêtine xwarê. Cendekên wan bi bêhurmetî kirine para heywanên hov û dirinde, nehiştine ku ew li gor adetên bavûkalan bêne veşartin, bibin xwedî gor û kêlekê.

Bi vî rengî, ev gel ji alîyê rejîmeke dîktator ve, li deverên cihê cihê yên komarên Sovyetê, hatîye tarûmar kirin. Qir, neman û belengazî bûye qeyd û zincîreke koleyan di stûyê wan de. Bi salan li ber xwe dane da ku rehên wan neqele, li warê nû hêşîn bibin û jiyana xwe bidomînin.

Wê jiyana ne xweş, pêjmûrde û aloz demeke dûrûdirêj kudand heta ku dinya guherî, pê re jî rewşa kurdan.

Niha kurdên Qazaxistanê ew rojên reş li dû xwe hiştine û jiyaneke xweştir dibuhirînin. Di gel xelkên Qazaxistanê pêkve û wek bira dijîn. Ji ber kurdbûna xwe nayên zêrandin. Di nav wan de dînamîkeke xurt heye ku xwe li gor pêşveçûna aborî, civakî û sîyasî biguherînin. Di gel wê herikînê bi rê ve biçin û hemaheng bijîn. Dest ji tiştên kevneperest û paşdemayînê berdin û berê xwe hertim bidin pêş. Kurdbûna xwe, ziman, çand û dîroka xwe biparêzin. Ji hev re xwedî derkevin.

Me di wan çend rojan de rewşa kurdên xwe bi çavên xwe dît, derd û kulên wan yên rojên tarî bihîstin û bûn hevparên wan yên wan rojan û herweha hêvîyên wan yên rojên pêş. Em bûn mêvanên wan, me mazûvanîya wan ya camêrane dît, bûn şahidê kesera dilê wan ya dûrîya ji welat.

Spas û hezar spas ji bo wan rojên xweş bi we re, qedirzanî û qedirgirîya we. Bila mal û jiyana we şên be, rojên xweştir bibin para we.

Ev hevalên han di civînê de beşdar bûn:
Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Omîdê Mistefayê Celalî (Bazîd), Elîşêr (Wan), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Eyub Kiran (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Zinar Soran (Dêrik), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî).

Encamên xebata ji vê civînê li jêrê têne pêşkêş kirin.

## Marên Kurdistanê

**Amadekar: Eyûb KIRAN**

| kurdî | latînî | tirkî | fransizî | îngilîzî |
|---|---|---|---|---|
| marê cûn, marê gewr | *coluber caspius* | hazer yılanı | dolietrophis Caspius | caspian whipsnake |
| marê duserî | *eryx jaculus* | mahmuzlu yılan, iki başlı yılan | boa des sables | javelin sand boa |
| marê reş, reşemar | *coluber jugularis* | kara yılan | dolietrophis jugularis | large whip snake |
| marê teyar, tîremar, tîrmar, marê siwaran | *coluber najadum, platyceps najadum* | ok yılanı | cinglard, fouet | slender whipsnake, Zagros whipsnake dahl's whip snake |
| marê belek | *coluber nummifer* | sikkeli yılan | hemmorrhois nummifer | asian racer, coin-marked snake |
| marê belek yê sermezin | *coluber ravergieri* | kocabaş yılan | hemarrhois raverfieri | spotted whip snake |
| marê sor | *coluber schmidti* | kırmızı yılan | couleuvre de Schmidt | red-bellied racer |
| marê belek ê Ruhayê | *coluber (spalerosophis) diadema* | urfa yılanı | spalerosophis diadema | diadem snake, royal snake |
| marê belek ê Serêkanîyê | *coluber ventromaculatus* | benekli yılan | coluber ventromaculatus | hardwicke's rat snake, glossy-bellied racer |
| marê tixbelek, marê tuxobelekî | *eirenis coronella* | halkalı yılan | eirenis | crowned dwarf racer |
| marê belek yê qut | *eirenis lineomaculatis* | bodur yılan | eirenis lineomaculatis | common english name is not available |
| marê piştbişirît | *eirenis decemlineatus* | çizgili yılan | eirenis decemlineatus | narrow-striped dwarf snake |
| marê stûreş | *eirenis collaris* | yakalı yılan | eirenis | collared dwarf racer |
| marê avî, marê avê | *natrix tesellata* | su yılanı | couleuvre tessellée | dice snake, water snake |
| marê peravan | *natrix natrix* | yarı sucul yılan | couleuvre à collier | grass snake |
| maregîskê mezin | *vipera/macrovipera lebetina* | koca engerek | vipère du levant | levantine viper, blunt-nosed viper |
| marê Wanê | *eirenis punctatolineatus* | van yılanı | eirenis punctatolineatus | dotted dwarf racer |
| marê serreş | *eirenis rothii* | kudüs yılanı | eirenis rothii | roth's dwarf racer |
| marê zer | *elaphe quatuorlineata (sauromate)* | sarı sıçan yılanı | couleuvre à quatre raies | four-lined ratsnake |
| marê malan, marê kulînan | *elaphe situla* | ev yılanı | couleuvre léopard | european ratsnake, leopard snake |
| marê serkort | *malpolon monspessulanus* | çukurbaşlı yılan | couleuvre de Montpellier | montpellier snake |
| marê zer yê serî reşbelek | *eirenis (pseudocyclophis) persicus* | iran yılanı | eirenis persicus | dark-headed dwarf racer |
| marê zer yê serreş | *rhynchocalamus melanocephalus* | toprak yılanı | rhynchocalamus à tête noire | black-headed ground snake, palestine kukri snake |
| marê çavpisîk | *telescopus fallax* | kedi gözlü yılan | couleuvre-chat d'Europe | cat snake |
| marzurî | *leptotyphlops macrorhynchus* | ipliksi yılan | myriopholis macrorhyncha | longnosed worm snake, hook-snouted worm snake |
| marê kor | *typhlops vermicularis* | kör yılan | indotyphlos braminus | blind snake |
| koremar | *vipera aspis* | engerek | vipère | viper |
| marê biqiloç, marê serbizin | *vipera ammodytes* | boynuzlu engerek | vipère ammodyte | nose-horned viper, sand viper |
| maregîskê Qersê | *vipera wagneri* | vagner engereği | montivipera wagneri | wagner's viper |
| maregîskê Agirîyê | *vipera raddei* | ağrı engereği | montivipera raddei | armenian/ caucasus viper |
| marê serşonik | *walterinnesia aegyptia* | çöl kobrası | cobra noir du désert | desert black snake, black desert cobra |
| marê serşonik | *elapidae (fam)* | kobra | elapides | elapids |
| marê pozdirêj | *rhinotyphlops episcopus* | sivriburun yılan | carphophis | worm snake |

www.arsivakurdi.org

# Peyvên ji zargotina kurda

**Ji pirtûka: O. Celîl û C. Celîl, 1978**
**Amadekar: Zinar SORAN**

| kurdî | tirkî | fransizî | îngilîzî |
|---|---|---|---|
| Razanxane | yatakhane | dortoir | inn, dormitory |
| Revoçî | at bakıcısı | palefrenier | hostler, stableman |
| Şûlikîn; sûrikîn | süzülmek, sürünmek | se glisser, s'insinuer, se faufiler | to glide, to slink away, to slip away |
| Komek; komekî | yardım | aide, assistance | help, aid |
| Qeretûk, qeratî, reşayî | karartı, siluet | silhouette, figure dans l'ombre | shadow, figure in the dusk |
| Şaqis man; şeqizî man | hayrete düşmek, şaşa kalmak | être étonné, être stupéfié | to be perplexed, to be bewildered |
| Şendilxwaz; Şemdilxwaz, desteguLî, şertê dilxwazê, bi dilxwazî | lades oyununda kim ne dilerse şartı | Parie ce que tu veux (quand deux parieurs tirent un bréchet de volaille chacun de son côté) | whatever wish (when two persons pull a wishbone apart the one getting the longer fragment will have his wish granted) |
| hespê kêşê | asil at | cheval pur-sang | highbred horse |
| çok vedan; çok dan | diz çökmek | s'agenouiller | to kneel |
| miçilge(h) | bahis, şart | pari | bet, wager |
| peşkilandin; peşkivandin | dağıtmak | disperser | to deal, to hand out |
| peşkilîn; peşkivîn | dağılmak | se disperser | to scatter |
| balçîq; destîyê şûr | kılıç kabzası | garde (d'une épée) | hilt |
| jingavan | sığırtmaçın kadını | femme du bouvier | cowherd's wife |
| bahan ; bahane | eve yakın tarla | champ proche de la maison | a field nearby the home |
| penî lê dayîn; pehnî kirin, pehnî dan | topuklamak | frapper du talon | to kick, to give a kick |
| lopijîn | debelenme, çırpınma | se débattre, s'agiter | flicker, flutter |
| tilîpan; tilîpantk, fîtke, fîtok, çiprîsk, çipisk, çipîsk | fiske | chiquenaude | flick, FLIP |
| çaqûlî | çelme | croche-pied | trip (the action of tripping someone) |
| derzenek | bel kemiği, omurga | épine dorsale | backbone, spine |
| çerêx | iz | trace, empreinte | trace, track |
| ferhît; ferxê hûtan | 1.balina yavrusu, 2.dev yavrusu | 1. baleineau, 2. enfant d'un géant | 1. calf of the whale 2. young of the giant |

# Devokê Berrîya Mêrdînê
## - XIII -

**Amadekar: Hemîd KILIÇASLAN**

| kurdî | tirkî | fransizî | îngilîzî |
|---|---|---|---|
| şîrevoçkî; şîrevanakî, şîravokî | tatsız tuzsuz yiyecek şeyler | fade, insipide | tasteless |
| şîrkuştî; şîrherimî | süt yoksunu | privé d'allaitement | run dry of breast milk |
| şîrvekirin; şîrevekirin | sütten kesmek | sevrer | wean |
| şiva hesin; şiva hesinî, şiva trênê | ray | rail | rail |
| sîwan | hale, ayla | auréole | halo |
| <heyvê sîwana xwe gerand> | ayın etrafında hale oluştu | la lune a un halo | halo appeared around the moon |
| sinoq; sinûx | sönük, sinmiş | éteint, découragé, déprimé | extincted |
| şolifandin | yüzüne gözüne bulaştırmak | s'empêtrer | to mess up |
| som kênandin <soma keçikê kênandin> | halel getirmek | dénigrer, diffamer | to injure (sb's reputation), to defame |
| şorbeşîr | sütlaç | crème au riz | rice pudding |
| stûleq; stûhej, serhejhejok | titrek boyunlu | qui a des tremblements dans le cou (dystonie cervicale) | person with neck tremor (cervical dystonia) |
| stûqulîk | boyun arkası | nuque | nape (of the neck) |
| xwîrazk | salamura | saumure | brine |
| tarik; tarikê rêxê | tezek kasnaği | cadre en bois utilisée dans la confection de galettes de bouse de vache séchée | round frame for making dung fuel |
| tewşiya xewê | uyku sersemliği | étourdissement au réveil | drowsiness, somnolent |
| reşkê şevê; teba, têba | gulyabani | épouvantail | bogey, goblin |
| tekirme avêtin | dokundurmak, sataşmak | taquiner | to tease, to taunt |
| tekirme | dokundurma, sataşma | taquinerie, aggression verbale | taunt, tease |
| têkişandin | yorgan gibi şeylere yüz çekmek | mettre une housse (à une coquette, un édredon) | to stretch out the bedclothes |
| tel; te'êl | yan | côté | side |
| li tela yekî ketin | dokunmak, alınmak | être offusqué, être froissé | to resent, to take umbrage at |
| telaqreşî | karalama, karaçalma, iftira | dénigrement, calomnie | aspersion, slander |
| telp <telpa qahwê> | telve | marc de café | coffee grounds |
| terrvebûn; terrevebûn | 1. yeşarmek, 2. kadının bir süre sonra hamile olması | 1. reverdir, 2. être fécondée, être engrossée | 1. reviving, reinvigoration, 2. getting pregnant after a period of infertility |
| tev derbas kirin; şehkî derbas kirin | birbirine geçirmek | imbriquer | to intertwine, to interlace |
| tevîzok | sancı başlangıcı, sancı belirtisi | signal annonciateur de spasmes, début de spasme | ague, chill |
| tevzî | spazm | spasme | spasm |
| tevrabûn | 1. kalkışma, 2. kabarma | 1. soulèvement, 2. ballonnement | 1. rebellion, uprising 2. bulge |
| hilpesirîn | kabarma | enflement, ballonnement | swelling |
| tewaş | yağlı | gras, graisseux | tallow, fatty |
| tê werbûn (di… de werbûn) | 1. yüksek bir yerden düşme, 2. aldanma | 1. tomber de haut, 2. se tromper | 1. fall in 2. fall for |
| tewr; awa, şikil | tür, çeşit | sorte, variété | kind, sort |
| tewtihîn | sendelemek | chanceler | to totter, to reel |
| textik; text | demir girmez arazi | terrain dur, incultivable | hard soil |
| textirme | harman öncesi ihtiyaçlık buğday | blé non vanné | unthreshed wheat for keeping purposes |
| tiftifandin | bezenme süslenme | se pomponner | to primp oneself |
| tilîping | pandik atma oyunu | un jeu populaire kurde | a kurdish folk game |
| tilîweş | parmakları döken bir tür cüzzam | variété de lèpre se portant sur les doigts | a type of leprosy causes shedding of fingers |
| tiridînî; tiredînî | delişmen, zıpır | foufou, folâtre, espiègle | idiot |
| tiroviro | eften püften, saçma sapan | absurdité | nonsense |
| tixarîs | yamuk | trapèze | trapezium; skew |
| top | kumaş topu | rouleau de tissu | roll of cloth |

www.arsivakurdi.org

# Di devoka celaliyan a Bazîdê de “erd, av û hewa” -II-

Amadekar: Omîdê Mistefayê CELALÎ

## av:

| kurdî | tirkî | fransizî | îngilîzî |
|---|---|---|---|
| - ava kaniyan | kaynak suyu | eau de source | spring water |
| - ava berf û baranê | sarnıç suyu | eau de pluie | stored rain water |
| - ava şor | tuzlu su | eau salée | saltwater |
| - ava tehl | acı su | eau amère | bitter water |
| - ava tirş (ava madenî) | maden suyu | eau minérale | mineral water |
| - av dikişe/tê: av diherike | su akıyor | l’eau coule, l’eau s’écoule | the water is flowing, is streaming |
| - av birrîn | suyu kesmek | couper l’eau (en irrigation) | to stem the water (in irrigation) |
| avbirr | tarımda su kesme dönemi | période de coupure d’eau | the period of stemming water (in irrigation) |
| - xûlexûla avê | su uğultusu | murmure de l’eau qui coule | the murmur (purling, babbling) of streamin water |
| - camaxa avê | diş tartarı, calculus | tartre | tartar, calculus |
| camaxî bûn: camax girtin | diş tartarlanmak | s’entartrer | calculus (tartar) formation |
| camaxê lê xistin | tartar hastalığına yakalanmak | avoir une inflammation dentaire due au tartre | to get calculus (tartar) |
| - av lê rast kirin: bêyî delav av berdan ser mêrg an jî zeviyê | salma sulama | irriguer (les prés ou les champs) | flood (surface) irrigation |
| av zayîn | yerden çıkmak (su), kaynamak (su çıkmak) | sourdre | to issue, to come up (water) |
| *avzêmk: ava ku dizê û nakişe | su kaynağı, kaynarca | source d’eau coulant en plusieurs endroits | source (with still water) |
| serkanî | çok kaynaklı alan | zone riche en sources | spring-rich area |
| kanîkork | kurupınar | source à sec | dried-up spring |
| benda avê; bendav | baraj, set | digue, barrage | dam, weir |
| -devê bendê | baraj kapağı | porte d’une digue, d’un barrage | dam cover |
| delav; derav | 1. su tevzi hattı, 2. delta, 3. su geçidi, | 1. ligne de distribution de l’eau, 2. estuaire, 3. passage de l’eau | 1. irrigation ditch 2. delta 3. waterway |
| - delav kirin | su tevzi sistemi yapmak | répartir l’eau d’irrigation | to distribute water (in irrigation) |
| lêkend | sel | crue | flood |
| lempere; pêl | dalga | vague | wave |
| lempere rabûn | dalgalanmak (su için) | former des vagues, onduler | to billow, to undulate |
| qersî | kışları donmayan ırmak | cours d’eau qui ne gèle pas en hiver | unfrozen river in winter |
| bîjek | sazlıklarda ot bitmeyen kanal | canal d’irrigation où l’herbe ne passe pas | a pathe through reedy marsh |
| pîjdangên bîjekê | yenilebilir körpe kamış | roseau tendre consommable | newly grown reed |
| hûfik: şikeve: sarinc | soğuk hava deposu | chambre froide | cold store |
| **barij û baran** | | | |
| barij | serpme yağışlı, rüzgarla yağan yağmur | pluie et vent | wind with sprinkle |
| barij; bariş | yağış | pluie, précipitation | downfall |
| ewr; hewr | bulut | nuage | cloud |
| hîs | buğu | buée | mist, steam |
| avhêsrî bûn: hîs girtin | buğulanmak | s’embuer | to mist, to become misty |
| pûsî | kış başlangıcı kırağısı | gelée hivernale précoce | early winter frost |
| qiravî | güz sonları kırağısı | gelée de fin d’automne | late autumn frost |
| dêjnî/dêjnij; reşêk <dêjnijeke baranê bariya> | kısa süreli yağmur | ondée, giboulée, pluie brève | shower |
| zîpik: cureyekî barijê yê ku hebên wê qeşakî û gir in; çandiniyê dike xesîl | dolu | grêle | hail |
| - zîpikê hûr | ufak dolu | grêle fine, grésil | small hailstone |
| - zîpikê gir | iri dolu | grosse grêle, grelon | big hailstone |
| şexte | 1. şidetli rüzgarla gelen zarar verici dolu, 2. don | 1. tempête de grêle, 2. givre | 1. hurricane, 2. frostbite |
| çem | puslu hava | brume, | misty weather |

## ba

| | | | |
|---|---|---|---|
| bahork | meltem rüzgarı (bihar, payîz û havînan) | brise | breeze |
| tîpî | kar fırtınası | tempête de neige | snowstrom |
| bayê jêrîn: bayê bêderan/bayê ecem | güneydoğudan esen rüzgar | vent d’été du sud-est | southeaster, southeast wind |
| bayê jorîn: bayê giran ê rojavayî ku ewran diweşîne û ji hev belav dike; sar û hênik e, nahêle baran bibare | kuzeybatı rüzgari | vent froid du nord-ouest (qui dissipe les nuages) | northwester, northwest wind |
| dewqelîn/bayê Elegezê, bayê qibleyê yê germ; bayê ku erdê diqelîne û çandiniyê hişk dike | sıcak güney rüzgarı | vent du sud qui assèche les terres et dessèche les récoltes | a hot south wind |
| arzeba; werzeba: bayê biharê yê ku xwelî, ka û baranê direşîne, erdê ziwa dike, berf û bûzê dihelîne | kuzeydoğu rüzgarı | vent de printemps du nord-est, souvent accompagné de pluie | northeaster, northeast wind |



## berf-bûz

| | | | |
|---|---|---|---|
| berfê qilç girtîye: berfê kurşe girtîye: hişk bûye û mirov dikare bi ser re bimeşe, pê tê de naçin xwarê | kar donmuş | la neige est gelée et dure | the snow has crusted |
| şepe, berfa ku ba li cihekî kom dike | rüzgarın oluşturduğu kar yığını | amas de neige formé par les vents, congère | snowdrift, drifting snow |
| çîl: berfa hişk a ku pê tê de naçin xwarê | donmuş sertleşmiş kar | neige gelée et dure sur laquelle on peut marcher | crusted snow, frozen snow |
| tîl: bûza şimşat a ku mirov li ser dişiqite | buz pisti | piste gelée sur laquelle on peut glisser | ice |
| xizag; xizek | atlı kızak | traîneau à cheval | sleigh |

www.arsivakurdi.org

# Hin peyvên kêmnas – nenas (XI)

Amadekar: Reşo ZÎLAN

| **kurdî** | **tirkî** | **fransizî** | **îngilîzî** |
|---|---|---|---|
| lerzete: ricif | titreme | tremblement | tremble |
| lerzeta | sıtma titremesi, sıtma nöbeti | fièvre intermittente de paludisme | ague |
| hevişîn, hêvişîn, şîr miçiqîn | anne sütünün kesilmesi | tarissement du lait maternel | drying up of breast milk |
| xêlî; zehf, gelek | çok, epey | beaucoup, très | much, lots, many |
| hîvrû | ayyüzlü | visage de lune | moonfaced |
| pilût kirin: rût kirin | soyup soğana çevirmek | dépouiller | to rob |
| pilût: rût, tazî, rûs | çıplak | nu, dénudé | naked, bare |
| xwe qîlî ser pişta hespê kir:<br>xwe qîlî ser kirin | üzerine sıçramak | sauter sur un cheval,<br>monter à cheval d'un saut | he/she jumped upon the horse,<br>to leap on |
| çirtik; çêrî, qiçil, parçeyên ku<br>gûşîyê tirî pêk tînin | küçük üzüm salkimi | grappillon | tufts that make up<br>a bunch (of grapes) |
| îşqilkanê, hindilkê, îşqilk, hopkanê | seksek oyunu | marelle | hopscotch |
| <bi îşqilkanê diçim> | sekerek gitmek | marcher en ricochant | to skip, to ricochet |
| pîsxû(h) : bedxû | kötü huylu | mal élevé, qui a un sale caractère | ill-mannered, ill-natured |
| şermedar: şermezar, şermende | mahçup | confus, embarrassé | embarrassed |
| êqazk, pîqazk,<br>pêqilaçk *(chenopodium)*  | kazayağı | chénopode | goosefoot |
| savêr | köpek yalağı | écuelle du chien | trough for domestic dog |
| mijgiro | dabaklarken deride et<br>parçaları bırakma | restes de chair sur une peau<br>à tanner | remains of the meat on the<br>skin/hide (in tanning) |
| mixmor | kor ateş | braise incandescente | glowing fire |
| çîçk: pir hindik | çok az, azıcık | un peu | little, slightly |
| qolik | davul tokmağı | baguette de grosse caisse | drumstick |
| qolik; polik | altin veya gümüş pul | ancienne pièce de monnaie | golden or silver sequin/spangle |
| jî | 1. Yaş, ömür, 2. Ana kök,<br>3. Elek kirişi, 4. bazı telli muzik<br>enstrümanı kirişi | 1.âge, 2. racine, 3. corde de tamis,<br>4. corde de certains instruments<br>de musique | 1.age, 2.taproot, 3. the wire of<br>the sieve 4. the string of musical<br>instruments |
| gulîçek | dalcık | brindille, rameau | twig |
| qulbişkov(k); qulpik, xulpoq | düğme iliği, düğme deliği | boutonnière | buttonhole |
| gurûzî bûn, gurizî bûn | ürpermek | frissonner | to shudder, to tremble |
| <min mar dît gurûzîyê ez girtim> | yılanı gördüm ürperti tuttu beni | j'ai vu le serpent, j'ai été pris<br>de frissons | I saw the snake a shiver went<br>through me |
| gurûzî; gurûzekî, gurûsî | pürüzlü | rugueux | rough |
| pîrkotkî bûn; pîrotankî bûn | pörsümek | se ratatiner, se recroqueviller | to shrivel up |
| makmij: paroneyê (2 salî) ku dev<br>ji mêtina dêya xwe bernedabe | sütten kesilmemiş düve | génisse non sevrée | unweaned heifer |
| hamûd, haw | deve semeri | selle de chameau | camel saddle |
| gum: boşê deveyan | deve sürüsü | troupeau de chameaux | a herd of camels |
| qiyar: bi simtraşê rastkirina siman e | kayarlama, hayvan toynağını<br>nallanmaya uygun hale getirmek | parage du sabot avant le ferrage | preparing the hoof for shoeing |
| qiyar kirin: bi simtraşê sim traş kirin | nalbent bıçağıyla kayarlamak | parer un sabot | to pare the hoof |
| simtraş   | toynak bıçağı | fer à parer | paring iron |
| bavker: hêstir | katır | mule | mule, hinny |
| rewas: qusandina dêl û<br>bijîyên hespan | atların yele ve kuyruklarını<br>kesme | coupe de la crinière et la queue<br>d'un cheval | trimming horsehair (of the mane<br>and tail) |
| bavgur: kûçikên bavgur | kurt köpeği | chien-loup | wolf dog |
| nûber | yeni doğmuş hayvan yavrusu | nouveau-né (un animal) | newborn young (animal) |
| perbijang: = kêlî, kop | gözkapağı | paupière | eyelid |
| teşk | dizin iç kısmı | mollet | calf (anatomy) |
| bixawî: =bazinê dest/pê,<br>qevd (ya dest/pê) | bilek | poignet | wrist |
| serçimka guh | kulak üst ucu | extrémité supérieure de l'oreille | earlobe |
| dûrnêrî, | özlem (aşk) | désir ardent de revoir un être aimé | (amorous) yearning, longing |
| kût | kör | émoussé | blunt |
| <kêra kût> | kör bıçak | couteau émoussé, peu tranchant | blunt knife |
| vir | seyrek | clairsemé | sparse |
| malîvan | 1.Ev sahibesi,<br>2. Aile bireyi | 1. maîtresse de maison,<br>2. membre de la famille | 1.landlady,<br>2. member of a family |
| kerxîç, derxîçek | çalıdan yapılan kuzu ağılı kapısı | porte en branchages d'un parc<br>à agneaux | pen gate made of canes |
| berbanûk  | | | |
| çetel, çeqelîk, çiftelastîk,<br>çetellastîk, qewsik | çatallastik, sapan | lance-pierre | slingshot |

| | | | |
|---|---|---|---|
| payîze, payîzde, payîzî | güzün ekilen buğday | variété de blé semé en automne | wheat sown in autumn |
| ret bûn | bitmek, tükenmek | s'épuiser, finir, s'achever | to finish, to end (intr v) |
| ret kirin | bitirmek | achever, terminer | to finish, to end (tr v) |
| şarpe ; şalpe, şerpe' şe'r, eşarpe | eşarp | écharpe | scarf |
| sexme: rotik, xilç, hej, çuqlî, şivik şivika ku di ber fasûlye û sebzeyan de diçikînin ku xwe lê bigerîne | herek, ispalya | tuteur | prop (a pole or stake for holding up a plants) |
| eşkene: avgoşt | et suyu çorbası | bouillon de viande | broth |
| patîle, qatme, şamborek | gözleme | beignet | pirogue |
| xulqteng | asabi, sinirli | coléreux, emporté | ill-tempered |
| kûz kirin: xûz kirin | domaltmak | bomber, ballonner | to bulge |
| tilmeqûn | kaba et, popo, kıç | fesse | buttock |

# Hin peyv ji "Nameyek ji Şernexê

## ya pirtûka Evdirehman Gundikî

## - IV -

**Amadekar: Mistefa AYDOGAN**

| kurdî | tirkî | fransizî | îngilîzî |
|---|---|---|---|
| kundil hatin | çömelmek | s'accroupir | to squat, to crouch down |
| kunmêrû; mûristan | karınca yuvası | fourmillière | ant nest, ant colony |
| kunzivîrg | yaban bal arısı yuvası | nid d'abeilles sauvages | a wild bee's nest |
| kupirrûk | kalan kırık diş kökü | racine d'une dent cariée | the remainder of the root of a broken tooth |
| kûstan; kwêstan | yayla | estive, alpage | summer pasture |
| lawîn; kurî, kurînî | oğlan | garçon | boyhood, boy |
| **M** | | | |
| malqibîlg | şarjörlük | magasin d'une arme | magazine storage case |
| mazîçin | mazı toplayan | ramasseur de glands, glandeur | gallnut picker/gatherer |
| mecref | kayık küreği | rame | oar, paddle |
| mecrefvan | kürekçi | rameur | oarsman, paddler, rower |
| mehreg | otla doldurulmuş eyer | bât bourré de foin | a saddle stuffed with grass |
| mel; teyr: <melê baz> | kuş | oiseau | bird |
| mêjûk | süt kuzusu | agneau de lait | suckling lamb |
| mêrçak; çakemêr, mêrê çê | yiğit | brave, vaillant | a valiant person |
| merçiqandin; pelçiqandin, eciqandin | ezmek | écraser | to mash, to crush |
| merz | sınır | frontière | border |
| mêşdoz | arı kaşifi | chercheur d'abeilles | bee seeker |
| mîrgeh | emirlik, beylik | émirat, principauté | emirate |
| mîrmêş | ana arı | reine d'abeilles | queen bee |
| mirûç | bnr Kurmancî hej 39an | voir Kurmancî no. 39 | see Kurmancî number 39 |
| mişênî | kanat sesi | battement d'ailes | whirring, clapping of wings |
| mişûti, şûtik, piştebend, pişt, | kuşak | ceinture | sash, waistband |
| **N** | | | |
| nêjgirî | heybeyi çaprazlama sırtına atmak | porter une besace en bandoullière | to take the saddlebags off |
| nêrekevok | erkek güvercin | pigeon mâle | male pigeon |
| nihar | nara | cri, vocifération | shout, vociferation |
| **P** | | | |
| palûn kirin | koyun otlatmak | faire paître des moutons | to graze sheep |
| palûnvan | koyun otlatan | pâtre, pasteur | sheep grazier |
| parzon | taşıma heybesi | besace | a carriage saddlebag |
| paşdiz | hırsızlıkta kandırmakla yükümlü olan | voleur chargé de berner, de tromper | the one among thieves who is assigned the task of luring victims |
| patexwer | işbirlikçi | collaborateur | collaborator |
| patexwerî | işbirlikçilik | collaboration | collaboration |
| pehîz; payîz | güz, sonbahar | automne | autumn, fall |
| pejing; pej, pejel | küçük ve ince dal parçası | brindille | twig, sprig |
| pel | köz | braise | ember |
| pelgazg | maşa | pincettes | tongs, pliers |
| peloxte | yarı sönmüş ateş | feu mi-éteint | partially extinguished fire |
| perasû | kaburga | côte, côtelette | rib |
| perixandin, firkandin | ovmak | frotter | to rub, to knead |
| perwerayî | sarsak, kocamış | usé, élimé | worn-out |
| pesartin, <destê xwe pesart dîwêr> | dayamak | appuyer | to lean against, to recline on |
| pil | tutam | pincée | a pinch |
| pişteroj | güneş görmeyen yamaç | versant de montagne qui ne reçoit pas le soleil | the shady side of the mountain |
| piştqof | kambur | bosse | hunchback |
| pûnc | saçak kök | racine fibreuse | fibrous root |

**KURMANCÎ**

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information
© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, *www.fikp.org*
*Directeur de la publication :* **Reşo ZÎLAN**, *Réalisation :* **M. HASSAN**



www.arsivakurdi.org